 

*Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)* | *wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

**Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî**
**Xelek 19**

# Serpêhatiya Rêberê Kurd Abu Muslimê Xurasanî

## (5) Xurasanî - Damezrînerê Dewleta Ebbasî

### Destpêkirina Şoreşa Ebbasî:

*Abu Muslim* sala 128-ê goçî/745-ê z. gihîşte Xurasanê. Raste ku ew hên di ciwaniya temenê (umrê) xwe da bû, lê belê, bi siyaset û biryarên xwe, da çespandin ku taybetmendiyên rêveberiyê di wî da aşkera û diyarin; wek hêza gerînendeyî û rêvebirinê, konevanî û pêkanîna biryaran bi awayekî rêk û pêk, çalakiya berdewam, birêxistin û organîzekirina alîgiran. Dîtinên wî yên siyasî pragmatîk û li gor rewş û demê bûn û her wisa bikaranîna hemû keys û derfetan ji bo bicihanîna armana sereke û here girîng ku ew jî roxandina *Dewleta Umewî* û damezrandina *Dewleta Ebbasî* bû.

*Abu Muslim* rê û nexşeke gelemper danîbû ku cemawerên gel bicivîne ser hev û wan organîze bike. Wî ferman da niwêneran (endamên komîta navendî) û alîgiran (endamên komîteyên herêmî) ku li hemû war û navçeyên Xurasanê belav bibin; ew bi cil û bergên bazirganan li herêm bi herêm, bajar bi bajar û gund bi gund geriyan, ramanên tevgera (De'we) belav kirin û ji gel xwestin ku piştgiriyê bidin Îmamê ji *Malbata Pêximber*. Cemawerên gel tevî vê tevgerê bûn û *Abu Muslim* jî di standina arîkariyê ji Zerdeştiyan û hevkariya wan da jî biserket. Hejmara wan wê hîngê pir bû û bi encama siyaseta *Umewiyan* ya nijadperest ew dihatin perçiqandin û bê rûmetkirin. Di berjewendiya wan da bû ku *Dewleta Umewî* bê hilweşandin, û di cihê wê da dewleteka dademend bê avakirin.

Di sala 129-ê goçî/746-ê z. da nameyek ji *Îmam Îbrahîm* gihîşte *Abu Muslim* ku têda fermanê dide wî, ew tevgerê ji awa û şêweyê nehînî êdî bixe şêweyê aşkere. Di meha remezanê ya wê salê da *Abu Muslim* şoreşa li dijî *Dewleta Umewî* da destpêkirin û ew diyar kir. Wî du ordiyên leşkerî avakirin; yek bi navê (Siyah) bi durişm û alaya ku Îmam ji wî ra şandibû û ya din bi navê (Ewr) ku ew jî bi alayeka din ku Îmam jêra şandibû. Rengê herdu alayan reş bû. *Abu Muslim*, niwêner û alîgiran jî cil û bergên reş li xwe kirin û wisa rengê reş bû durişma *Dewleta Ebbasî*. Di nîvê şevê da agirekî xurt dadan û ev bû nîşana destpêka şoreşê. Ev mîna pêxistina agir di destpêka Newrozê da ye. Bê guman *Abu Muslim* ev yek bi temamî dizanî û dizanî ku nirxa agir di bermaya gelên Ariyanî-Rojhilatî da çi ye[1].

Dema *Abu Muslim* gihîşte Xurasanê, di navera Ereban da dubendî pêkhatibû. Li hêlekê Nizarî (Erebên Bakur) bi rêveberiya *Nesir Bin Seyyar*, mîrê Xurasanê ji hêla Dewleta Umewî da, û li hêla din jî *Yemanî* (Erebên Başûr) bi rêveberiya *Cudey' Bin Elî* ku bi lexem jêra

*Kermanî* dihate gotin. *Nesir* bi şerê li dijî *Kermanî* va xerîk bû. Alîgirên *Kermanî* dora dused hezar kes bûn. *Nesir* ji xelîfe *Merwan* arîkarî xwestibû ku leşkeran jêra bişîne, û ew agahdar kiribû ku tevgera Şî'etiyê jî li wir xurte û serekê vê tevgerê *Ibrahîmê Ebbasî* ye. Xelîfe *Merwan* ji waliyê xwe yê Urdinê xwest ku *Îmam Îbrahîm* ji El Humeyme jêra bişîne. Xelîfeyê *Umewî Merwan* wê hîngê bajarê Herranê ji xwe ra wek navendeka berdem girtibû. Dema *Îbrahîm* ji El Humeyme gihîşte wir, ew yekser xiste zîndanê û paşê ferman da ku ew bê fetisandin; serê wî xistin tûrekî (kîsekî) girtî, ew fetisandin û li Herranê binax kirin. *Îbrahîm* pêş rêwîtiya xwe ji El Humeyme wesek kiribû ku Îmametî di pey wî ra ji birayê wî *Ebdullah* (El Seffah) ra be[2].

Strategiya (nexşeya rê) ya *Abu Muslim* beramber *Dewleta Umewî* li ser sê bingehan hatibû avakirin: Propaganda û kişandina cemawer bi ser tevgerê da, sûd- û mifawergirtin ji dijberiya navbera *Nesir* û *Kermanî* û amadekirina şervanan ji bo bereya şerê leşkerî li dijî leşkerê Umewî. Armanca hevbeş di navbera *Kermanî* û *Abu Muslim* da roxandina *Dewleta Umewî* bû. Ji ber vê egerê di navbera wan da şer pêknehat. *Abu Muslim* bi konevaniya xwe ya dîplomasî wisa kir ku dijminahî di navbera *Kermanî* û *Nesir* da xurt û tûj bibe. Wisa lê hat ku her aliyek têdikoşî û hewl dida ku *Abu Muslim* bi aliyê xwe va bikişîne. Ev bi kêrî *Abu Muslim* hat ku bandora serdariya xwe hên firehtir bike. Hejmara şervanên wî gihîşt dora sed hezar kes. Li ker û hespan siwar bûn û dan rê. Gava ker diajotin digotin: "Here Merwan" Mebesta wan xelîfe *Merwan* bû û wisa gelek herêm bê berxwedan xistin bin destê xwe[3].

## Roxandina Dewleta Umewî:

Mîrê Xurasanê yê Umewî *Nesir* hewl da ku rêzên Ereban li dijî *Abu Muslim* xurt bike, û ji xelîfe xwest ku hin hêzên leşkerî yên din jêra bişîne. Lê belê xelîfe *Merwan* bi şerê *El Xewaric* ra xerîk bû. *Abu Muslim* bajarê Merû paytextê Xurasanê stand û hejmara leşkerên wî herku çû pirtir bûn. Êdî karê rêvebirinê baş organîze kir, jêra pêwan û nobetdar, dîwan (wezaret), walî û qadî çêbûn. Wî lekên leşkerî damezirandin û berê wan da ser çete û alîgirên *Dewleta Umewî* û hem jî zora hêzên *Kermanî* bir. Tevî ku ji Îraqê hêzên leşkerî ji bo arîkariya *Nesir* hatin jî, lê belê nikarîbûn li dijî leşkerên *Abu Muslim* biserkevin. *Nesir* ber bi rojava ve paşva vekişiya, û di sala 131-goçî da li nêziya Hemedanê (paytextê Medan yê berê) mir[4].

Piştî wê, *Abu Muslim* berê xwe da rojava û ber bi Kurdistanê va hat. Hin rêberên xwe yên leşkerî şandin ku bajarê Nehawend (li rojhilatê Kurdistanê) dorpêç bikin û bajar standin. Piştî şerekî hebûn û nemanê di navbera leşkerê *Umewî* û yek ji leşkerên *Abu Muslim*, leşkerê *Umewî* şikest û bazda. Bi vî awayî seranserê Îraqê jî ket bin serdariya şoreşê. Îmamê nû *Ebo El Ebbas El Seffah* û birayê wî *Ebo Ce'hfer El Mensor* ji El Humeyme hatin. Ebo Selme ew pêşwazî kirin û dora 40 rojî ew ji ber çavan bidûrxistin. Di vê navberê da *Ebo Selme* hewl da ku serdariyê ji malbata *Ebbasî* bide *Malbata Elewî* (îmamên Şî'etiyê yên rastîn). Lê belê di nav *Malbata Elewî* da tikes hêjayî xelîfetiyê nedît. Li hêla din, piraniya niwêneran li aliyê *Malbata Ebbasî* rawestiyan. Ebo Selme neçar ma ku sala 132-goçî/750-ê z. *El Seffah* wek xelîfe bipejirîne û diyar bike[5].

Niha ma ku em bipirsin: Gelo helwesta *Abu Muslim* ji mijara xîlafetê çibû? Divêt em bînin bîra xwe ku *Abu Muslim* ji *Îmam Îbrahîm* va pir nêzîk bû, Îmam ew kiribû mîrê tevgerê li Xurasanê, û ferman dabû ku hemû Şî'e li Îraq û Xurasanê di bin fermana wê da bin. Di rewşeka wisa da gelek aşkera ye ku *Abu Muslim* ji *Malbata Ebbasî* ra dilsoz be. Di agahdarî û nûçeyan da hatiye ku *El Seffah* birayê xwe *El Mensor* şandiye Xurasanê ba *Abu Muslim* daku *El Seffah* û cihgirê wî *El Mensor* wek xelîfeyên nû bipejirîne. Dibêjin ku *Abu Muslim* hatiye El Kufe, *El Seffah* wek xelîfe pejirandiye û dîsa vegeriyaye navenda rêveberiyê li Xurasanê[6].

Piştî ku hemû wilayetên rojhilat ketin bin serdariya leşkerê xelîfeyê *Ebbasî* yê nû, çend şerên dijwar di navbera *Ebbasî* û *Umewiyan* da li ber çemê Zab yê jorîn li navbera Hewlêr û Mûsilê li herêma Başûrê Kurdistanê ya niha pêkhatin. Leşkerên *Ebbasî* bi rêveberiya

*Ebdullah Bin Elî* (apê xelîfe) bû, û leşkerê Umewî bi rêveberiya xelîfe *Merwan Bin Muhemmed* bû. Xelîfe *Merwan* bi lehengî şer dikir. Lê belê hejmareka mezin ji lekên leşkerê Erebî pêra negirtin û neketin şer. Wisa leşkerê ku pêra mabû şikest û bazda(7).

Piştî şikestinê, *Merwan* vegeriya Herranê û ji wir hate Şamê. *Ebdullah* da pey wî û *Merwan* paşda vekişiya û giha Filestînê. *Ebdullah* li Şamê ma û hin lekên leşkerî li dû *Merwan* şandin. *Merwan* bazda û giha Misirê bi hêviya ku hin hêzên nû li wir bicivîne ser hev. Lê belê yek ji lekên leşkerê *Ebbasî* ji nişka va li bajarê Busîr yê Misirê gihîştin wî, ew kuştin, serê wî birîn û ji xelîfeyê *Ebbasî* ra şandin. Wisa em dibînin ku bi keda siyasî û leşkerî ya ku kurdê bi navê *Abu Muslim* berî wê bi neh salan destpêkiribû hîşt ku xelîfeyê *Umewî Merwan* (kurê jineka Kurd) bigihîne vê çarenûsa belengaz û xemgîn(8).

## Jêder

[1] El Tabari, Tarîx  El Tabari, 7/356. Ibin El Esir: El Kamil fi El Tarix, 47360. Ibin Kheldun, Dîroka Ibin Kheldun, 3/146.
[2] El Tabari, Tarîx  El Tabari, 7/287. Ibin Xellikan, Wefeyat El E'yan, 3/147. Ibin Kesir, Elbidaye we Alnihaye, çapa Îhya' El Turas, 10 /35 - 41.
[3] El Tabari, Dîroka El Tabari, 7/155 - 293. Hassan Ibrahim Hassan, Tarîx Elislam, 2/17 - 18. Mohammad Hilmi, Xîlafet û Dewlet, rûpel 37.
[4] El Tabari, Dîroka El Tabari, 7/360 - 367. Ibin Xellikan, Wefeyat El E'yan, 3/149 - 150. El Zehebî, Sîret E'lam Ennubela', 6/55.
[5] El Tabari, Tarîx  El Tabari, 7/429 - 430. El Zehebî, Sîret E'lam Ennubela', 5/56.
[6] Ibin El Esir: El Kamil l fi El Tarix, 5/7, 29. Salih Bin Suleyman El Weshmi, Abu Muslim El Khurasani, rûpel 154 - 155.
[7] Ibin El Esir: El Kamil fi El Tarix, 5/13. Ibin Xellikan, Wefeyat El E'yan, 3/151
[8] Ibin Xellikan, Wefeyat El E'yan, 3/151. Ibin El Esir: El Kamil fi El Tarix, 5/18. El Zehebî, Sîret E'lam Ennubela', 6/57 - 58.